# Komîdyaya Kurdî li Deşta Mêrdînê

## Helîmê Hiso û Ûnisê Amûdê



Alan PÎRÊ

Di vê gotarê da ez dê tenê behsa du henekbêjan an jî çawa ku li nav gelî dihên nasîn henekçiyan bikim. Yek ji wan koça dawî kirîye û li gund û bajarên Berîya Mêrdînê bi henek, stran û çîrokên xwe yên komîdî naskirî û navdar e, û yê din hîn jî di henekbêjîyê da li Qamişloyê berdewam e. Helîmê Hiso li nav civatên biçûk, li nav xelkên deverê, li nav biçûk û mezinan henek dikirin û pêkenok digotin û jin û mêr, xort û qîz li dora xwe dikenandin. Gelek pêkenok û çîrokên wî birastî bûn, pê ra çêbibûn an jî pê bihîstibûn. Ji bilî çîrokên tijî henek û qerf stran jî digotin. Stranên wî jî beşeka ji henekên wî bûn.

Awayê Helîmê Hiso yê henekbêjîyê gelekî balkêş bû. Gava ku mirov îro lê guhdarî dike, mirov tê derdixe ku henekên xwe baş hûnane û peyvên xwe bi şêweyekî hostane hilbijartine. Heger ew henek,



stran û çîrokên wî bibin tekst, dê bêguman berhemeka wêjeyî ya serkeftî ji wan derkeve. Helîmê Hiso henek, çîrok, stran û serpêhatîyên xwe bi piranî li nav civatan digot û carna li civata wî hin henekbêj, stranvan û muzîkjen jî kom dibûn û pê ra civat bi henek, stran û çîrokên xwe xweş û geş dikirin. Hin ji wan kesên amade Ûnisê Amûdê yê henekbêj û Şefîq Bavê Read yê stranvan bûn, yê ku vê dawîyê li nav gelî bi gotina straneka gelêrî "Adlayê" bi xurtî deng veda.

Helîmê Hiso henekên xwe wekî me got ji civakê dianî, ji derdora xwe, ji nav xelkê û hin ji wan jî serpêhatîyên wî bixwe bûn. Carna di wan henekên xwe da komîdyayeka reş ya gelê kurd sîmbolîze dikir û kêşeyên civakê bi şêweyekî wêjeyî vedigot û li hin dîyardeyên wê yên veşartî bi awayekî qerfane mukur dihat. Ji henekên Helîmî xuya dike ku humora wî ya taybet di asteka bilind da bû û dikarîbû çîrok û serpêhatîyên xwe di kirasekî komîdî yê lihevhatî da bide ser hev û raberî guhdarên xwe bike. Jixwe carna jî pirsgirêkên xwe yên malbatî dikir henek û ji derdora xwe ra digot, bê ku tiştekî jê veşêre, berovajî wê, serpêhatî bi hûrgilîyên wê digot piştî ku dikir henekeka sivik û tijî humor. Jixwe ji bo ku hûn Helîmî bêhtir nas bikin divê hûn çend nimûneyan ji henekên wî bixwînin

an jî li wî bixwe guhdarî bikin. Min ev her du nimûneyên jêrîn ji vîdyokeka wî ya tomarkirî ku vedigere 24.05.1998an girtine û dengê wî bê desttêwerdan transkrîpte kirîye. Di van henekan da şêweyê wî û hostatîya wî di çêkirin û afirandina henekan da xuya dike û çawa dikare ji serpêhatîyeka asayî henekekê derxe.

Di van henekan da hinek sixêf û gotinên "nexweş" derbas dibin, lê beşeka giring in ji çîrokê. Lê ev awayê vegotinê û gotinên bikarhatî bi giştî mirov nêzîkî jîyana rojane ya çîneka civakî li devera Berîya Mêrdînê dike.

## Nimûneya Yekem:

"Min û Ca Luqman, kevanîya xwe me tim pezê xwe êm dikir. Sibakê mi banê kirê, mi got Ca Luqman rab em pezê xwe êm bikin, Yisra Yisra, rab em pezê xwe êm bikin. Go ez mirî mi lo, halê mi tine yi lo. Wey! Keçê qehpikê, ji êvar di tu raketîyi heya niha. Yela eynî, yela gelbî[1], yela rihê min rab, ez li ser rihê te bigerim law, yanî wilo pê lê kimê lê. Go, kuro di rêya Xwedê di tê bela xwe ji mi veki merez. Kuro ez mirî mi, ez nexweş im. Qey pepûkê bira nexweş bû. Wele tim êm dikir. Ban bûkê xwe ke merez, di rêya Xwedê da ez nexweş im. Law mi go bûkê mi qehpika ranabin, ew û mêrê xwe heya seat deh di xew da ni.

Min ban kevanîya Luqman kir, Fewzîya, Fewzîya! Deng jê nehat. Min ban kevanîya Kamîran kir, Firyala, Firyala! Deng jê nehat. Min ban keçika xwe kir ya keçik, li wê da raketî bû. Min go wa Mawya, go: Ha Yabo, yabo mi go ez qurbana dergîsîyê te bim, tê rabe ji bavê xwe ri pez ji hewşê derxi, ez ê êm bikim yabo. Go: Xewa mi tê, min go rakev! Rakev!

Ê min î xort jî li wir i, bêbavo şîyar bû, wextê go mi go Rakan, min dî hema lihêfa xwe kişand ser serê xwe û go: Bine gi rebê[2] bavê Xwedê bê ti ban mi nek ha. Aew! Rebê bavê Xwedê tine law, rebê bavê Xwedê tine kuro.

Keçikek min heye, menxulî ye, navê wê Peymana ye, jêr dibêjin Wefa. Wilo Kes nizane bi firensî diştaxili, ne mengolî diştaxili; wilo çavên wan tevde menxulî[3] ni. Ew



jî rûniştî ye. Mi go Wefa, go ha yabo, mi go rab alî bavê xwe em pez êm bikin, û ez û keçika xwe em ê ji vî hundirî herin. Go herin beled[(4)], mi go erê ez û keçika xwe em ê herin beled, go em ê li tirimbêlê siwarên, mi go, zikê min mezin i, ma gi ne tirimbêl bi, ez karim bimeşim qîza min.
Wele Wefa rabû, min go bise ne bi fena bi, bi Xwedê ez û vê qehbika jinkê em ê pev kevin, pez ma bêêm. Ne bi fena bi, jinik ranabi. Mi stranek çêkir, mi go bise ez û keçika xwe em ê bîskê li hundir ji xwer şêxanî bireqisin û em ê dû di pezê xwe êm bikin. Wele min destê Wefa girt û ez Wefa li hundirê xênî şêxanî reqisîn. Min avêt ser nexweşîya jinkê, bûka, lêwik û keçikê û ranebû. Mi go:
Yisra ti Ca Wefa yi
Ji êvar di razayi
Çaxa êmê kuleka
Yisra ji niv di nalyayi
Min dengekî ban kir Fewzo
Min yekî ban kir Firyala
Hûn ji mi ri ban kin Mawyayê
Mawya ti xwa Rakan i, xewa wî pir giran i
Hîn kulek bêêm mani, Wefa gelkî xweşik i
Alî bavê xwe diki, wê pez jê ri êm biki.
Wele min dî jinkê go rab lo, rab ez ê êm bikim. Yewel[(5)] ez namirim û ji te xelas nabim. Mi xwe feqîr kir. Ma ez û ti li hevdû bûn bela. Min go: Na Ca Luqman rihê min, na. Mirin na, mirin na. Mirin ti bimiri, zikê min mezin i, kes nema bi min qayîl dibi, şûxlê min xerab i. Na, mirina na! Go: Ez nemirin, çilo ji te xelas bibim?
Min go ti qûzê ca xwe dixwi. Ti bixwazi ji min xelas bi, pîrek bi sê kevra tê berdan; zilam bi şeş kevra tê berdan. Raj şeş kevra, min telaq bik, ez hatim berdan û em ji hevdû xelas bûn. Go: Yewel gi ti bihata berdan, min ê te bi duwazde kevira berda, lê yewel ti bû bela, ti nema tê berdan. Rab ez ê êm bikim.
Wele me rabû, pezikê xwe êm kir; hat çayê jî çêkir ciwankê, me vexwar. Me reqsa xwe jî kir û me pezikê xwe jî êm kir û me çaya xwe jî vexwar. Em pev ketana, pez mabû bêêm".

## Nimûneya Duyem:

"Sendelo li welatê me hebû, navê wî Birahîm bû, jêr digotin Sendelo. Îc pepûko bîr dikolan. Bîr dikolan, îc ev bîrê berê, bîrê bîst metro. Bîst metro dikolan bi şêst wereqî û di bin erdê da yi, bîst metro û îc di ser xwe ri li erdê dinerî. Îc mi go, ti çilo elimî[(6)] kolana bîra

Birahîm? Go yabo min nizanîbû bîr bikolana, go rabû, go yekî go kuro ez dibînim ti tim betal i, go mi go law erê wele ez betal im û şuxul ji min nayê. Go wer ez te bielimînim kolana bîra. Mi go ez nizanim bikolim, go kuro hema ti ji mir xilc bigir û bi metro yi, metro bi sê wereqa yi û mi heşt metro kolayi ti şirîkê her heşt metra yi. Mi go wele baş i.

Go yabo ez jî ketim bîrê, min xilc jê ri girt, go bêbavo gava gi çakûç bilind kir, û go di bîrê di fisek kir. Mi go, di vê bîra teng, heşt metra kwîr û hilma vê fisê ketê. Serê mi çû û hat, go ji mir go hevalo bigir, hevalo bigir! Go serê mi wek dolabê, ez neelimîmi, hevalo bigir. Go da da, go hebikî ber çavê mi rihnî bû. Go gava çakûç dîsa bilind kir, go hevalo ez ê bikim go roja te îro bîst wereqe bi. Go çakûç bilind kir û yek di jî kir. Go nema qedîya, go mi go, hevalo bîst wereqe gelek i bavo, hema îdare bi. Go nema îdar e jî dibû. Go mi xilc avêt û ez revîyam.

Go bi Xwedê ez elimîm kolana bîra. Îc pepûko bîr dikolan, îc li vê da li Şercî(7). Gi dihat êvarî pal dida, hingî kelmêşa dev lê dikirê. Digo weh, weh! Bi şeqama bi xwe diket. Kelmêş pir bûn, hingî dev lê dikirinê. Wele ma ma, qey hedana



wî, debara wî nebû. Go: Xwedê niha tu çi dawê li mi diki, ka wer ji mir bêj? Ev dawa te li mi çi yi? Ez sibê ro hiltê, qazimê mi di destê mi da yi ez bîra dikolim, ma her du seatê şevê jî qey ti nahêli ez rakevim lo! Ma ez Hecî Hemîdê Fatimê mi, ez ê heyanî nîro li ber sîkê rakevim. Niha van kelmêşa ebadetek ji te ri bikira, diatek ji te ri bikira, min ê bigota ev kelmêş ji bo çi, lê ka te ji bo çi çêkirini, mane te ji gelacî çêkirini, ma ka ji bo çi yi lo?!".

Wekî em dibînin, heneka yekem serpêhatîyeka Helîmî bixwe bû, bûyereka li mala wî çêbibû. Ya din jî ji hinekan bihîstibû, lê ne rasterast ji me ra dibêje, belê kirasê xwe yê henekbêjîyê di destpêkê da lê dike û ji niv ra dibêje.

Henekbêjê duyem Ûnisê Amûdê

ye. Ûnis hîn sax e û li Qamişloyê dijî. Carna li ser medîya sosyal hin vîdyoyên wî dihên belavkirin. Di wan da hejmareka henekên nû û kevin dibêje, hin jê bixwe çêkirine û hin jî bihîstine. Ûnis dibêje ku ew şagirtê Helîmê Hiso ye û li gelek civatên wî amada bûye. Lê awayekî Ûnisê yê taybet di vegotina henekan da heye, cuda ye ji yê Helîmo. Vê yekê hişt ku ew jî cihekî xwe yê giring di nav henekbêjên deverê da bigire.

Helbet henekbêjî li herêma Berîya Mêrdînê kêm zêde bi van her du kesan dihê naskirin û ew bi tena serê xwe lehengên vê qadê ne li deverê.

---

*1.Bi erebî ye. "Heydê çavên min, heydê dilê min!"*

*2.Navekî Xwedê ye di zimanê erebî da.*

*3.Nexweşîyeka mîratî ye. Nav nexweşîyê yê zanistî "Down-Syndrom".*

*4.Bajar.*

*5.Li herêmê dihê bikaranîn, wateya wê nêzîkî "hey tu tu!" ye.*

*6.Fêr bû, hîn bû.*

*7.Navê gundekî ye.*